ISSN: 2149-2751
e-ISSN: 2149-2751
International Journal of Kurdish Studies
http://www.ijoks.com/

Research Article

**International Journal of Kurdish Studies**
11 (1), pp. 176-191
http://www.ijoks.com

# Di Baweriyên Gel Yên Duhokê De Nîşaneyên Mirinê

***Israa Musheer Ahmed AHMED*[1]**

**Received**: Dec 14, 2024 **Accepted**: Feb 22, 2025

**Kurte**

Ev gotar, baweriyên gelêrî yên derbarê nîşaneyên mirinê yên xelkê herêma Duhokê dinirxîne. Di berdewamiya tarîxê de mirovan mirin hem wekî dawiyeke biyolojîk hem jî wekî raboraneke ruhî dîtiye. Mereqa derbarê mirinê de bûye sedemê derketina baweriyên çandî û dînî yên curbicur. Çanda Kurdî, di bin bandora dînên kevin yên wekî Zerduştî û Êzidiyatiyê û dînên semawî yên wekî Îslam, Xirîstiyanî û Yahûdîtiyê, tesewirên cuda yên mirin û piştî mirinê derxistine meydanê. Di nava xelkê Duhokê de nîşaneyên mirinê; bi awayên curbicur yên wekî ta, guherînên ji nişkê ve yên fîzîkî û psîkoljîk, xewn û tevgerên heywanan, têne eleqedarkirin. Bi taybetî tevgerên heywanên wekî se, mih, bim, mirîşk, pisîk û qijakê, wekî sembolên ku mirinê xeber didin, têne dîtin. Dîsa, bûyerên kozmik ên wekî xurîcîna stêrkan jî wekî xebera mirinê tên dîtin. Ev bawerî xwe dispêrên tecrûbeyên xelkê yên derbarê mirinê û baweriyên wan ên dînî. Xelkê li hemberî nîşaneyên mirinê, ji bo ku bandora mirinê kêmtir bike, yan jî rê li ber wê bigire, rêbazên curbicur bi kar anîne.

**Peyvên Sereke:** Bawerî, Mirin, N,îşaneyên Mirinê, Xelk, Duhok

**Recommended citation:**
Ahmed, I. M. A. (2025). Di Baweriyên Gel Yên Duhokê De Nîşaneyên Mirinê. *International Journal of Kurdish Studies,Volume 11* (1), 176-191, **DOI**: **https://doi.org/10.21600/ijoks.1601231**

[1] Ph.D. Can, On Dokuz Mayis University, Türkiye, e-mail: sraamusheer1@gmail.com,
**ORCID**: https://orcid.org/0009-0003-6843-1907

**Snake Motif in Duhok Folk Beliefs**

**Abstract**

This article examines the traditional beliefs of the people living in the Duhok region regarding the signs of death. Throughout history, humans have viewed death as both a biological end and a spiritual transition. Curiosity about death has led to the emergence of various cultural and religious belief Kurdish culture, influenced by ancient religions such as Zoroastrianism and Yazidism, as well as monotheistic religions such as Islam, Christianity, and Judaism, has developed different conceptions of death and the afterlife. Among the people of Duhok, signs of death are associated with various indicators such as fever, sudden physical and psychological changes, dreams, and animal behavior In particular, the behavior of animals such as dogs, sheep, owls, chickens, cats, and crows is considered symbols that herald the approach of death. Additionally, cosmic events like shooting stars are also seen as omens of death. These beliefs are based on the people's experiences with death and religious conviction In response to these signs of death, the people use various traditional methods to mitigate or prevent its effect.

**Keywords**: Belief, Death, Signs of Death. People, Duhok.

**Destpêk**

Mirin, rastiyeke teqez e di jiyana mirovan de û xala herî dawiyê ye. Ev rastî, di berdewamiya tarîxê de ji bo gelek çand û baweriyan bûye egera meraq û lêkolînan. Wateya mirin û jiyana piştî mirinê, hebûna ruhî û nîşaneyên mirinê, têgihiştina çandên cuda ya mirinê diyar kirine. Nîşaneyên mirinê di baweriyên xelkê Duhokê de, di vê mijarê de xwedî cihekî giring e. Armanca vê xebatê, bi rêya baweriyên xelkê Duhokê yên derbarê nîşaneyên mirinê de, vekolandina kokên van baweriyan û têkiliyên wan ên çandî ne.

Di vekolînê de em dikevin pey bersiva van pirsan: Di nava xelkê Duhokê de nîşaneyên mirinê çi ne? Ev nîşane di bin bandora kîjan dîn û baweriyan de mane? Baweriyên derbarê nîşaneyên mirinê de, li ser jiyana rojane û rituelên xelkê Duhokê bandorên xwe yên çawa hene? Bersivên van pirsan ji bo fehmkirina têgihiştina mirinê ya xelkê Duhokê û kokên çandî yên vê têgihiştinê girîng in.

Baweriyên derbarê nîşaneyên mirinê de, tesewirên xelkê yên li ser mirinê û fehmkirina nîşaneyên nêzîkbûna mirinê vebeyan dikin. Xelkê Duhokê, di jiyana xwe ya rojane û di nava rîtuelên xwe de cihekî giring didin nîşaneyên curbicur ku hatina mirinê salox didin. Ev lêkolîn, armanc dike ku kokên baweriyên xelkê Duhokê yên derbarê nîşaneyên mirinê de, peywenda tarîxî û çandî ya van baweriyan û rîtuel û tedbîqên xelkê yên derbarê mirinê de destnîşan bike.

Giringiya lêkolînê ji wê çendê tê ku, bi rêya wê dê baştir bê fehmkirin ka baweriyên xelkê Duhokê yên derbarê nîşaneyên mirinê de, bi rêya raboriya dewlemend a çandî û tarîxî ya herêmê çawa dirûv girtiye. Ev bawerî, divê hem wekî perçeke sermiyana çandî ya herêmî, hem jî bi nezereke berfirehtir ya antropolojîk û sosyolojîk bên nirxandin. Vekolandina baweriyên xelkê Duhokê yên derbarê nîşaneyên mirinê de, mijarên mirin û jiyana piştî mirinê, dê ji bo pirsên gerdûnî bersivên cuda pêşkêş bike û ji bo pêkhatina sermiyaneke çandî ya dewlemend bibe piştevan.

Girêdayî çarçoveya lêkolînê, baweriyên xelkê Duhokê yên derbarê nîşaneyên mirinê de, kokên van baweriyên yên tarîxî û çandî, bandora dînên semawî û baweriyên herêmî ya li ser wan, dê bêne nirxandin. Dîsa, rengvedanên pratîkî yên baweriyên derbarê nîşaneyên mirinê de, cihê wan ê di jiyana rojane û rîtûelên xelkê de dê bêne analîzkirin. Di vê çarçoveyê de, diyardeyên wekî nîşaneyên mirinê têne qebûlkirin, xewn, tevgerên heywanan û bûyerên meteorolojîk dê bi hûrgilî bêne nirxandin.

**Rêbaz û Sewirandina Vekolînê**

Ev vekolîn, ji bo ku li ser baweriyên xelkê Duhokê yên nîşaneyên mirinê hûr bibe, pala xwe dide sêwirandina vekolîna teswîrî (wesfî). Vekolîn, di çarçoveya modela venêrîna teswîrî de ye û li ser baweriyên xelkê Duhokê yên dînî û çandî analîzeke kûr dike. Modela venêrîna teswîrî, dibe egera vekolandina rewşa heyî bi awayekî kûr û berhevkirina daneyên derbarê pêvajoya dirûvgirtina baweriyên xelkê.

**Beşdar**

Beşdarên vekolînê, ji wan kesan pêk tên ên ku li herêma Duhokê dijîn û derbarê baweriyên xelkê de şareza ne. Beşdar, ji temenên cuda û rabirdûyên cuda yên sosyo-çandî pêk tên. Çarçoveya

vekolînê, hemû kesên li Duhokê dijîn, dihewîne û nimûne ji 50 kesan pêk tê ku bi awayekî giştî hatine hilbijartin. Beşdar ji wan kesan hatine hilbijartin ku derbarê nîşaneyên mirinê û wateyên van nîşaneyan ên çandî de xwedî agahî ne.

**Amrazên Berhevkirina Daneyan**

Wekî amrazê berhevkirina daneyan forma hevdîtinê ya nîv-vesazkirî hat bikaranîn. Forma hevdîtinê, pirsên ji bo fehmkirina baweriyên xelkê Duhokê yên derbarê nîşaneyên mirinê de, kokên van baweriyan û tedbîqên wan, di nava xwe de dihewîne. Dîsa, girêdayî agahiyên ji beşdaran hatine berhevkirin, rîtûel û tedbîqên xelkê herêmê yên derbarê nîşaneyên mirinê de hatine tomarkirin.

**Berhevkirin û Analîza Daneyan**

Daneyên heyî, bi rêya hevdîtinên rasterast ên ligel başdaran hatine berhevkirin. Hevdîtin, ji bo ku beşdar di civatek rehet de bi rehetî bikarin fikrên xwe bibêjin, bi awayê rûbirû pêk hatin. Daneyên hatine berhevkirin, bi rêya rêbaza analîza naverokî hatine dahûrandin. Analîza naverokî rê dide ku mijar û qalibên di nava daneyan de bêne diyarkirin, bi vî rengî bawerî û têgihiştinên xelkê Duhokê yên derbarê nîşaneyên mirinê de bi awayekî kûr têne dahûrandin.

**Di Baweriyên Gelêrî yên Duhokê de Nîşaneyên Mirinê**

Mirin û jiyana piştî mirinê, di temamiya dinyayê de, di nava kevneşopiyên çandî û dînî yên cuda de bûye sedemê mereqeke zêde û mijara vekolînan. Mereqa mirovî ya bihêz a li hemberî mirinê, lêgerîna wî ya nemiriyê û daxwaza berdewamiya ruhî, bûye sedem ku mirin ne tenê wekî veqetîneke fizîkî, di heman demê de wekî derbazbûneke ruhî jî bê fehmkirin. Di vê peywendê de, mijarên wekî; nîşaneyên mirinê, rêwîtiya berdewamiya hebûna ruhî ya piştî mirinê, têkiliya ligel zindiyan û lêgerîna ruhî ya ji bo hizûrê, bûne sedem ku di nava çandên cuda de fikra derbarê mirin û jiyana piştî mirinê de şikil watedar bibin. Vê pirrengiyê, ji bo pirsên gerdûnî yên mirovatiyê yên derbarê mirin û jiyanê de bersivên curbicur pêşkêş kirine û di vê mijarê de sermiyaneke dewlemend a çandî pêk aniye.

Têgeha mirinê, di berdewamiya tarîxê de ji dînên semawî û çandên dinyewî şopên kûr dihewîne. Çanda Kurdî, di bin bandora baweriyên dînî yên kevin ên wekî Êzidiyatî, Zerdeştî û dînên

semawî yên wekî Îslam, Xirîstiyanî û Yahûdîtiyê şikil girtiye. Ev pirrengî, dibe sedem ku derbarê mijarên wekî wateya mirinê, hebûna ruhî û jiyana piştî mirinê de bawerî û tedbîqên cuda derkevin meydanê.

Heke bersiva pirsa “mirin çi ye?” bê dayîn; mirin, ligel baweriyên ji dînên berê heya dînên nû û çandên cuda, bi awayekî giştî dikare di peywendeke hevpar de bê pênasekirin. Ev pênase tê wê wateyê ku mirin veqetîna ruhî ji bedenê, bidawîbûna bedenê ya bîyolojîk û derbasbûna ruhî ya dinyayek din, bedenek din, an jî heyberek din e (Frazer, 2019, 41-87; İnan, 2020, 179-201).

Di berdewamiya tarîxê de ka çawa mirin bûbe sedemê mereqekê, bi heman awayî wextê mirinê jî ji bo mirovatiyê bûye sedemê mereqeke zêde. Fikrên derbarê wextê mirinê de; ligel daxwaza zanîna dahatûyê, hin tevgerên derveyî jiyana jirêzê, bikaranîna amûran a bi awayên cuda, bûyerên meteorolojîk, dengên tevgerên heywanan, dîmenên di xewnan de û guherînên psîkolojîk û fîzyolojîk di nexweşan de, gelek caran wekî nîşaneyeke mirinê, pêşdiyardeyeke wê têne qebûlkirin (Örnek, 1971, 15). Baweriyên xelkê Duhokê yên derbarê nîşaneyên mirinê de, bi awayekî giştî tesewirên derbarê mirinê de û pêşdiyardeyên ku nêzîkbûna mirinê destnîşan dikin, dihewîne.

**Nîşanana Nexwşîna Tayê û Mirin**

Di nava xelkê Duhokê de yekem nîşaneya mirinê ku yê bawerkirin, ta/herareteké ye, ev bawerî bi gotina pêşiyan ya “ba elameta berfê, ta elameta mirinê ye” tê piştrastkirin (K.b 1, 4, 6, 5, 9,15, 25, 26). Dîsa, wekî nîşaneyên mirinê guherînên ji nişkê ve yên fizîkî û psîkolojîk, guherîna di daxwazên kesan de, cudahiyên di daxwazên wan de û xewn, dikarin bên hesibandin. Wekî sedemê van guherînan, wisa tê bawerkirin ku kes beriya mirina xwe çil rojan di nava bihuştê de ye û belgên “dara jiyana mirovî” êdî zer dibin û diweşin. Wisa tê bawerkirin ku belg dê di roja mirinê de bikeve, ji ber hindî ew kes di vê proseyê de dikeve nava fikaran. Ji bo vê rewşê biwêja “çil rojên dawiyê serê mirovî birî ye” tê gotin (K.b 20, 32, 33). Bi taybet zerbûna rûyê mirovî ya ji nişkê ve (K.b 17, 19, 21, 22, 26, 32, 33, 44), terka tiştekî ku jê hez dike, yan jî keyfa zêde ya li hemberî rewşekê, wekî nîşaneyên derabarê nêzîkbûna mirina wî kesî tên dîtin (K.b 10, 33, 40).

**Nîşanên Mirinê di Xewnê de**

Li gorî baweriyên gelêrî yên Duhokê yek ji nîşaneyên din ên mirinê xewn e. Bi taybetî, wextê kesek xizmekî xwe yê ji zûde mirî di xewna xwe de dibîne, wisa tê bawerkirin ku yan ew kes, an jî kesek ji malbata wî dê bimire (K.b 6, 8, 14, 34, 35). Ketina diranî jî di baweriyên gelêrî yên Duhokê de bi mirinê re tê girêdan. Ketina diranên pêşiyê ji bo mirina kesên nêzîk, ketina diranên paşiyê jî ji bo mirina xizmên dûr tê şirovekirin (K.b 21, 23, 22, 30, 31, 36, 43). Di xewnê de kolana axê jî teqabilî mirina kesekî ji malbatê dike (Cafer, 1993, 53). Heke di xewnê de dîwarê malê hilweşe, wisa tê bawerkirin ku dê malxwêyê malê dê bimire (K.b 28). Wextê di xewnê de bê dîtin ku cihên zavatî yan bûkaniyê li ser yekê ne, ev ji bo ew kesên têne dîtin sembola mirinê ye (Cafer, 1993, 55). Dîsa, serjêkirina mihekê di xewnê de, teqabilî mirina kesekê dike (Cafer, 1993, 55).

**Nîşanên Mirinê di Guherînên Fizîkî û Psîkolojîk de**

Li gorî baweriyên gelêrî yên Duhokê guherînên fizîkî û psîkolojîk yên li ser kesekî nexweş, wekî nîşaneyên nêzîkbûna mirinê têne qebûlkirin. Bo nimûne, zêdebûna îştaha nexweşî ya ji nişkê ve (K.b 1, 17, 23, 46, 26, 37, 38, 39), gazîkirina xizmên xwe yên mirî (K.b 1, 8, 22, 37), berêxwedana nexweşî ya cihekî sabît û jorê (K.b 32, 44), derketina ji nava nivînan ji nişkê ve û xuyabûna wî ya bi awayekî tendurist (K.b 1, 6, 26, 29, 37, 44), ziravbûna difna nexweşî (K.b 37), lalbûna ji nişkê ve ya nexweşî (K.b 44), xweşikbûna ji nişkê ve ya nexweşî (K.b 19, 21, 43, 33, 37), xwestina avê ya birîndarekî (K.b 6, 33), ji bo mirina nexweşî wekî nîşaneyên mirineke nêzîk têne şirovekirin.

Di çanda Duhokê de şiroveyên ku ev guherînên di nexweşî de teqabilî nêzîkbûna mirinê dikin, ji ber pergalên dînî û çandî ne. Bo nimûne, wextê nexweşek bangî xizmên xwe yên mirî dike û berê xwe dide cihekî sabît, bi gotineke din, baweriya ku kesê nêzîkî mirinê xwedî wê hêz û şiyanê ye ku tiştên em nikarin bibînin, dibîne, ji hin ayet û baweriyên dînî ye ku yek ji wan ev e: “Bêyî şik tu ji vê çendê xafil bûyî û me perdeya te ya xefletê rakir. Îro êdî çavê te dijwar/xurt e” (Kehf 50, 22). Dîsa xweşikbûna nexweşî ya ji nişkê ve yan jî guherîneke wî, baweriyên bi vî rengî, ji ber saloxên dînên semawî, bi taybetî yên Îslamê ne. Ji nişkê ve rabûna ser pêyan a nexweşî û saxbûna wî û zêdebûna îştaha wî, yan jî xwestina avê ya kesekî birîndar, qebûlkirina wan tiştan a wekî nîşaneyên mirinê, em dikarin bibêjin ku ji ber çavdêriyên mirovî yên ji tecrûbeyên jiyanê ne.

**Nîşanên Mirinê di Tevgerên Heywanan da**

Di baweriyên gelêrî yên Duhokê de, yek ji nîşaneyên nêzîkbûna mirinê ligel tevgerên heywanan tê eleqedarkirin. Tevger û dengên nenormal yên heywanên derdorê, wekî xebera mirinekê tên nirxandin û ev rewş ji terefê xelkê ve wekî nîşaneyên beriya mirinê tên bawerkirin (K.b 10, 34, 35, 40, 42, 44, 45, 46). Ji bo tevgerên heywanan yên ku mirinê salox didin, em dikarin van mînakan bidin.

**Se**

Se, di gelek çandên dinyayê de hewyanek e ku ligel mirinê tê eleqedakirin. Bo nimûne, Di çanda Misira Kevin de, se jiyana jêrzemînî û dinyaya miriyan temsîl dikin. Bi heman awayî, li Meksîkaya Kevin, Giravên Kanaryayê, Şaristaniya Mayayê, Bombay, Aztek, xwecihên Afrîkayê, Îrana Kevin, Hindistan, di nav qebîleyên Bantu yên Angolayê, gelê Bambara û gelek xelkên serdema ewil yên Asyayê, wisa tê bawerkirin ku di rêwîtiya insanî ya piştî mirinê de seyek ligel wî ye. Ji ber vê baweriyê, di rêwîtiya bo dinyaya din de ligel mirovî seyek jî hatiye veşartin (Florioti, 2014, 51-52). Di Zerdeştiyê de ku qismek Kurd jî jê bawer in, roja qiyametê li ser pira Cinvatê (Siratê) seyek dê rêbertiya mirovan bike û dê wan heya deriyê bihuştê bibe (Çeper, 2020,380).

Wextê li gundekî Duhokê seyek li şûna ku bike ewte-ewt, bike zûrezûr, wisa tê bawerkirin ku ev tê wateya mirina kesekî. Ji ber ku, li gorî baweriya xelkê Duhokê se wextê ku hatina Azraîl dibînin, dizûrin (K.b 8, 14, 44). Ev bawerî, hem ligel dostanî û parêzvaniya seyan ya ji bo mirovan di berdewamiya tarîxê de pêwendîdar e, hem jî tê bawerkirin ku se ruhên xirab dibînin. Dîsa, bingeha pêwendîdanîna seyan ya bi dinyaya miriyan, her wekî li gorê tê dîtin, pala xwe dide gelek şaristaniyên qedîm ên dinyayê.

**Mih**

Di nav xelê Duhokê de wextê mihek wekî seyekî rûdine, ev ji bo mirina kesekî wekî nîşaneyekê tê dîtin. Di vê rewşê de xelk vê tevgera mihê wekî bêyomiyekê dibîne û wisa bawer dike ku mirina kesekî nêzîk bûye. Ji ber hindê jî, ji bo ku rê li ber zerera vê bêyomiyê bigirin wisa bawer dikin ku divê ew mih demildest bê serjêkirin (K.b, 14, 40, 41). Di bingeha vê baweriyê de, ligel baweriya ku tevgerên nenormal bêyomiyê tîne, eleqedarkirinê mihê ya ligel mirinê jî heye. Bi

taybet mihên ku rengên wan ne spî ne, di hin çandan de wekî heywanê xudayê jêrzemînî û ruhan hatiye qebûlkirin û ji ber vê jî di rîtuelên şînê de hatine qurbankirin. Ev rîtuel, bi giştî ji bo ruhên bab û kalan, an jî her wekî di baweriya Şamanîzmê de, ji bo parastina ji ruhên xirab pêk hatine. Di çanda Îslamê de jî mih li şûna Îsmaîl ji bo Xuda tê qurbankirin û wekî sembola mirin û qurbanê hatiye qebûlkirin (Özdemir, 2021, 23).

**Bûm/Kund**

Çalakbûna bûman di şevê de û hebûna wan a zêde ya di goristan û xirabeyan de, bûye sedem ku ev teyrik di berdewamiya tarîxê de û di nava baweriyên gelek şaristaniyan de ligel mirin û bêyomiyê bê eleqedarkirin. Ev bawerî, ji serdemên berê heya roja me, wekî motîfeke çandî ya kûr hatiye qebûlkirin. Bo nimûne, li gorî pergala baweriyê ya Misira Kevin wisa tê bawerkirin ku mirov ji du aliyên bingehîn pêk tê: yek ji van wekî hêmaneke fizîkî “Ka”, ya din jî temsîla mirin û jiyana piştî mirinê “Ba” ye. Wisa tê bawerkirin ku kesek piştî mirina xwe, li nav gora Ka heya roja qiyametê disekine û di vê proseyê de ligel Ba dibe yek. Baweriya ku; di vê proseyê de Ba piştgiriya Ka dike, Ba bi vê egerê her şev di kirasê bûmekê de diçe serdena gora kesê mirî, berbelav bû. Ji ber vê, di çanda Misira Kevin de bûm ligel goristanan hatine eleqedarkirin û wisa hatiye bawerkirin ku bûm ruhê mirî temsîl dike. Li Çîna Qedîm jî, wisa hatiye bawerkirin ku, bûm di tariya şevê de li kêleka goran disekinin û di maweya rêwîtiya wan a ji bo dinyaya din de wan diparêzin. Li Romayê jî, wisa hatiye bawerkirin ku fîtîna bûman hatina mirinê salox dide. Girêdayî vê baweriyê, bi hêviya ku kehaneta bûman ji meydanê rakin, hewil dane ku bûman bigirin û bişewitînin (Morris, 2010, 21-36). Her wekî gelek çandên din, di baweriyên gelêrî yên xelkê Duhokê de jî, fîtîna bûman ligel mirina kesekê hatiye şirovekirin (K.b 3, 7, 10).

**Mirîşk**

Di baweriyên gelêrî yên Duhokê de wextê mirîşkek dengê dîkan derdixe, ev ji bo mirovan wekî nîşaneya bêyomiyê tê qebûlkirin. Ji ber baweriya ku, wextê mirîşkek dengê dîkekî derdike dê kesek bimire, demildest biryara serjêkirina mirîşkê tê dayîn û hewl tê dayîn ku ev bêyomi ji meydanê rabe (K.b 14). Bangdana dîkan ya bêwext di hemû cîhana Tirkan de, wisa tê şirovekirin ku hemû ruhên xirab têne hişyarkirin û ew zirarê didin kesên malê (Albayrak, 2006, 73).

Di baweriyên gelêrî yên Duhokê de bangdana mirîşkan a wekî dîkan, an jî bangdana dîkan a bêwext wekî bêyomî tê dîtin, li gorî vê fikrê sedemê vê jî ew e ku xirabbûna pergala kozmîk dê bibe sedemê kaosê. Li gorî vê fikrê xirabbûna pergala kozmîk wekî bêyomî tê dîtin. Ji ber hindê, bangdana mirîşkê wekî dîkan, di binhişê kolektîf de, bi guherîna pergala siruştî an jî nerehetiya wê re tê eleqedarkirin (Demir, 2022, 280).

**Pisîk**

Têkilîdanîna pisîkê ya ligel efsûn û şiyanên derasayî, di kevneşopoyên folklorîk û mîtolojîk ên cîhanî de xwedî rabirdûyeke dirêj e. Ji Misira Kevin bigire heya baweriyên roja me, figûrê pisîkê ligel çendîn wateyên sembolîk û wayetên derasayî tê eleqedarkirin.

Di Misira Kevin de eleqeya pisîkê ligel hin xwedawendên wekî Bastet ji nêzîk ve hatine danîn û wekî heywanên pîroz rêzeke zêde ji wan re hatiye girtin. Ji bo pisîkan qurban hatine dayîn û ji bo xilasiya ji xezeba wan mirovan cedel dane. Dîsa, pisîk wekî parêzvan jî hatine dîtin û ji bo parastina mirovan a piştî mirinê di nava tedbîrên efsûnî de cih girtine. Di Misira Kevin de, mirovan di gorên xwe de pisîk mûmya dikirin û li gorî vê baweriyê dê mirî ji dijminên xwe bêne parastin (Mursi, 2010, 25-27).

Pisîkan di mîtolojiya Yewnanî de cihekî xwe yê girîng heye; bi taybetî ligel efsûn, efsûnkarî û Hekate, xwedavenda heyvê tê eleqedarkirin. Di Yewnana Kevin de pisîk hem wekî heywanekî kedî, hem jî wekî bûnewereke derasayî dihat qebûlkirin ku alîkarî dida cadûyekê. Di şaristaniya Romayê de bi taybet pisîkên reş wekî tezahura şeytanî hatine dîtin. Di serdema navîn de, li Ewropayê, baweriya ku şeytan û cadû di kirasên pisîkan de ne, berbelav bû. Heya serdema Ronesansê, li Ewropayê wextê pisîkek reş rêya we bigire, wisa dihat bawerkirin ku cadûyek ji bo ku zererê bide we, ligel şeytanî hevkarî kiriye (Yuko, 2021). Ketine cihan di kirasê pisîkan de nemaze di Misira Kevin de baweriyeke berbelav bû. Dîsa, dihat bawerkirin ku pisîk dikarin cin û melekan bibînin, heta dikarin Azraîl hîs bikin. Di nava hin çandan de dihat bawerkirin ku ruhên miriyan di kirasên pisîkan de diçin serdana malên xwe (Mursi, 2010, 55-59).

Di baweriyên gelêrî yên Duhokê de jî hin tevgerên pisîkan bi mirinê re têne eleqedarkirin. Tê bawerkirin ku wextê pisîkek nêzîkî nexweşekê dibe, ew ê sax bibe, wextê jê dûr dikeve jî ew ê

bimire. Dîsa wisa tê bawerkirin, heke pisîkeke reş têkeve malekê ew ê kesek ji wê malê bimire (K.b 33, 37, 38, 40, 44, 47; Bafi, 1999, 40; Saaid, 2011, 72).

**Qijik**

Têkiliya qijikê ligel mirin û bêyomiyê, di metnên kevin ên mîtolojîk û dînî de, û baweriyên çandî de bi berfirehî tê dîtin. Bi nimûne, di destana Gilgamiş de, di beşa xilasiya Ut-Napiştim ji tûfanê de, tê behskirin ku wextê av vedikişe, ji bo ku nêzîkahiya keştiyê bo erdî bipîvin qijikekê dişînin, feqet ev qijik bi xwarinê ve mijûl bûye û venegeryaye keştiyê. Di kitêba Afirandinê de jî çîrokeke wisa heye; wextê av vedikêşe, Nuh ji keştiyê qijikekê dişîne bejahiyê lê qijik carek din venagere. Dîsa, di Incilê de qijik wekî sedemê xirabiyê tê behskirin. Di kitêba Sefanyayê de, tê behskirin ku piştî hilweşîna Nînovayê dê di nava xirabeyên bajarî de bûm û qijik bijîn (Sax, 2010, 32,38). Di Qur'anê de ji bo veşartina birayê Kabîl, ku bi destê wî hat kuştin, qijikek tê şandin (Maide 5: 31). Her wekî tê dîtin di gelek çandan de qijik bi mirin û bêyomiyê hatiye eleqedarkirin. Di baweriyên gelêrî yên Duhokê de, qajîna qijikê, wekî nîşaneya mirina kesekî ya li heman cihê tê qebûlkirin (K.b 2, 11, 27, 33).

**Nîşanên Mirinê de Xirûcîna Stêrkan da**

Di berdewamiya tarîxê de mirovan hewl daye peyamên veşartî yên gerdûnê fehm bikin. Di vê peywendê de hin bûyerên astronomîk, kozmîk û meteorolojîk wekî nîşaneya mirina kesekî, yan jî ya mirinê bixwe hatine dîtin. Di nava xelkê Duhokê de xirûcîna stêrkan nîşaneya mirina kesekî ye (K.b 3, 5, 12, 13; Saaid, 2011, 66). Guherîna rewşa hewayî ya ni nişkê ve, barîna xwê yan jî sorbûna esmanî, bi giştî teqabilî mirina kesekê, bi taybet a alimekî dike (K.b 6, 25, 37, 39, 48).
Baweriya xirûcîna stêrkan a di nava du çandan de, yek ji têkiliyên dînî û efsûnî di navbera esman û erdî de, xwe dispêre baweriya ku her mirovek wekî stêrkeke li esmanî hatiye sêwirandin. Di vê peywendê de, di navbera stêrk û mirovan de ji layê "xirûcîn", "koçbûn" û "vemirîn"ê de şebiyet tê danîn (Örnek, 1971, 24).

Ji xeynî baweriyên xelkê Duhokê yên derbarê nîşaneyên mirinê de, tê bawerkirin ku wextê kesek dimire, heke du caran gora wî/wê kesî neyê hildan, ew gor nayê girtin (K.b 40, 44). Dîsa, wisa tê bawerkirin ku heke zarokek bênavber berê xwe bide jorê û bigirî, ew ê kesek bimire (K.b 19, 20, 21, 43). Wan heyamên ku hêj nexweşiya apandîsîtê nedihat zanîn, wisa dihat hizirkirin ku kesên

bi vê nexweşiyê ketine, ji ber ku pê li zarokên cinan kirine, ji terefê cinan ve hatine cezakirin. Wisa dihat bawerkirin ku cezayê vê jî tenê bi mirinê dihat encamdan (K.b 1, 12; Cafer, 1993, 7).

**Regırtın li Mirinê**

Xelkê Duhokê wextê bi nîşaneyên mirinê dihese, giringiyê dide van nîşaneyan û ji bo ku rê li ber mirinê bigire, serî li çendîn rêbazên gelêrî dide. Yek ji van rêbazan, wextê heywanek nîşaneyeke mirinê dide, ew heywan tê serjêkirin û wisa rê li ber mirinê tê girtin. Bi vî rengî, bi mirina heywanî, ew kesê ku dê bimire xilas dibe. Dîsa, wextê kesekî nexweş ber bi mirinê ve diçe, zarokek li derdora wî heft caran tê gerandin û wiha tê gotin, "bila ev ser qurbanî vî serî bibe" û wisa tê bawerkirin ku ew ê nexweş ji mirinê xilas bibe (K.b 14). Hin kes jî lo derdora heywanekî (mih, bizin û hwd.) têne gêrandin û ev rîtuel pêk dihat (K.b 42, 46). Ji xeynî vê, wextê xewneke ku mirin salox dida, didîtin, ji bo ku bandora xewnê ya kujer berteref bikin, ji kesê re behsa wê nekirin û tenê ji avê re digotin (K.b 16, 28, 29, 33, 49, 50). Bingeha baweriya ku, bandora xirab ya xewnê bi rêya avê diçe, ji ber hindê ye ku av paqijker e, li ser saxlemiya mirovan bandoreke xwe ya erênî heye û xwedî hêzeke fizîkî û manewî ya şifadar e. Dîsa, girîngiya avê ya di baweriyên semawî de û pîroziya wê, bingeha vê baweriyê ava dikin.

**Encam**

Vê vekolînê derbarê nîşaneyên mirinê de baweriyên dewlemend û têkel ên xelkê Duhokê derxistine meydanê. Daneyên vekolînê nîşan didin ku li Duhokê mirin ne tenê dawiyeke fizîkî, di heman demê de derbasiyeke ruhî jî ye. Baweriyên berbelav ên di nava xelkê de, nîşan didin ku nîşaneyên mirinê ligel hin bûyerên fizîkî, psîkolojî û siruştî pêwendîdar in.

Encamên vekolînê nîşan didin ku baweriyên xelkê Duhokê yên derbarê nîşaneyên mirinê de, bi têkiliyên curbicur ên dînî û çandî yên di berdewamiya tarixî de, pêk hatine. Hat dîtin ku bi taybetî bandora Zerdeştî, Îslam û baweriyên herêmî li ser van baweriyan çêbûye. Dîsa, hat famkirin ku bûyerên wekî tevgerên heywanan, xewn û bûyerên meteorolojîk wekî nîşaneyên mirinê hatine qebûlkirin.

Wekî encam, baweriyên xelkê Duhokê yên derbarê nîşaneyên mirinê de, dewlemendiya dînî û çandî ya herêmê nîşan didin. Ev bawerî, ne tenê di asta takekesî de, di heman demê de di asta civakî de jî ji bo rîtuel û tedbîqên derbarê mirinê de bûne pal û pişt.

Pêşniyarên ji bo lêkolînên paşerojê yên di vî warî de, pêkanîna analîzên berawirdî yên baweriyên mîna hev ên li herêmên cuda yên kurdan û vekolîna çawaniya têkiliya van baweriyan bi dînamîkên civakî-çandî re ye. Wekî din, bandorên van baweriyên li ser civaka nûjen û çawaniya pêşkeftina wan di bin guheztina mercên civakî de jî dibe ku di nav mijarên hêjayî lêkolînê de bin. Xebatên bi vî rengî ji bo parastin û têgihiştina mîrata çanda kurdî xwedî girîngiyeke mezin in.

## Çavkanî

### Çavkaniyên Nivîskî


Albayrak, E. (2006). Erciş’te Eski Türk İnançlarının İzleri. Teza Masterê ya Neçapbûyî. Niğde Üniversitesi Sosyal Bilimleri Enstitüsü Türk Dili ve Edebiyatı Anabilim Dalı.

Bafi, B. (1999). Bîrûbawerên Kevin di Nav Miletê Kurd da. Duhok: Weşanên Hawar.

Cafer, H. (1993). Hindek Bawerên Xelkên li Badînanê. Bexda: Weşanên Kelepora Kurdî.

Demir, T. (2022). Türk Kültüründe Geçiş Dönemleri Büyülerinin Mitolojik ve Dini Kökenleri. Çanakale: Paradigma Akademi Yayınları.

Florioti, H. D. (Mayıs 2014). ‘’Eski Kültürlerde Köpeğin Algılanışı: “Eski Mezopotamya Örneği’’.Tarih Araştırmaları Dergisi 33 (55), 45-70.

Frazer, J. G. (2019). Ruhun Tehlikeleri ve Tabu. Çev. Yılmaz, İ. H. İstanbul: Pirhan Yayıncıları.

İnan, A. (2020). Tarihte ve Bugün Şamanizm. 10. Baskı, Ankara: Altınordu Yayınları.

Morris, D. (2010). Albuma Tarixu’ho Al-tabii ve Al-Takafi (Baykuş: Doğal ve Kültürel Tarihi). Çev. Cabir, A. Abudebi: Abudebi Kültür Yayınları.

Mursi, F. (2010). Al-Kıt Fi Al-Muutakad Al-Şaabi (Halk İnanışlarında Kedi). Al-Kahire: Genel kültür Merkezi.

Örnek, V. (1971). Anadolu Folklorunda Ölüm. Ankara: Ankara Üniversitesi Basımevi.

Özdemir, D. (Mayıs 2021). ‘’Halk İnanışlarının Mitolojik Kökenleri: Konya (Kadınhanı) Örneği’’. Toplum, Ekonomi ve Yönetim Dergisi 2 (1), 18-33.

Saaid, N. M. (2011). Hın Aliyen Civake Kurdi d Kültüre Geleride (Halk Kültüründe Kürt Toplumun Bazı yanları). Duhok: Yayın ve Gazeteciliğin Genel Müdürlüğü.

Sax, B. (2010). Al-gurap: Tariho Al-tabii we Al-takafi (Karga: Doğa ve Kültür Tarihi). Çev. Hemidan, İ. Abudebi: Abudebi Kültür Yayınları.

Yuko, E. (Ekim 2021). ‘’Why Black Cats Are Associated With Halloween and Bad Luck?’’ (Siyah Kediler Neden Cadılar Bayramı ve Kötü Şansla İlişkilendirilir?)’’. https://www.history.com/news/black-cats-superstitions. Erişim Tarihi: 15.07.2024.

**Çavkaniyên Devkî**

| **Kode Bej.** | **Nav** | **Paşnav** | **Temenn** | **Perwerde** | **Pîşe** | **Tarîxa Hevdîtinê** | **Navnîşana Hevdîtinê** |
|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1. | Ahmet | Muhammad | 75 | Nexwende | Cotkar | 01.09.2023 | Şeladizê |
| 2. | Semyan | Abdulrahman | 88 | Nexwende | Bermalî | 01.09.2023 | Şeladizê |
| 3. | Haci | Harıs | 72 | Lîsans | Mamosteyê Teqawitbûyî | 31.08.2023 | Navend |
| 4. | Medine | Ahmed | 93 | Nexwende | Bermalî | 13.08.2022 | Gundê Etitê |
| 5. | Hoşefi | Hassen | 67 | Nexwende | Ajalvan | 02.09.2023 | Şeladizê |
| 6. | Cemil | Mıhe | 76 | Dibistana Navîn | Teqawit | 03.09.2023 | Navend |
| 7. | Halit | Hızır | 76 | Lîsans | Mamosteyê Teqawitbûyî | 24.08.2023 | Akre |
| 8. | İsmail | Şahin | 66 | | | 23.08.2022 | Semel |
| 9. | Cemil | Şelazi | 53 | Pêş Lîsans | Mamoste | 01.09.2023 | Kediş |
| 10. | Hekim | Gaberki | 53 | Lîsans | Mamoste | 08.08.2022 | Merkez |

| | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 11. | Neciba | Zeyneddin | 68 | Nexwe nde | Bermalî | 01.09.2023 | Şeladizê |
| 12. | Muhammed | Ağa | 76 | Pêş Lîsans | Bekkal | 20.08.2023 | Akre |
| 13. | Ferset | Merii | 63 | Lisansüstü | Akademsyen | 23.08.2023 | Navend |
| 14. | Saiid | Sofi | 86 | Nexwende | Xizmetkarê Mizgeftê | 24.08.2023 | Akre |
| 15. | Hüsseyin | Titep | 79 | Xwende | Cotkarê Teqawitbûyî | 31.08.2023 | Zawîte |
| 16. | Jiyan | Ahmed | 54 | Lîsans | Bermalî | 12.08.2023 | Navend |
| 17. | Ayşe | Yunus | 64 | Nexwende | Bermalî | 03.09.2023 | Navend |
| 18. | Hussam | Muhammed Salih | 35 | Master | Akademîsyen | 01.09.2023 | Şeladizê |
| 19. | Xecice | Salih | 65 | Nexwende | Bermalî | 25.08.2023 | Zawîte |
| 20. | Zehra | Ahmed | 47 | Dibistana Seretayî | Bermalî | 25.08.2023 | Zawîte |
| 21. | Şüküriye | Salih | 77 | Nexwende | Bermalî | 29.08.2023 | Girdesin |
| 22. | Awaz | Hessen | 45 | Lîsans | Mamoste | 19.01.2024 | Gundê Etitê |
| 23. | Pehşan | Hessen | 30 | Lîsans | Bermalî | 19.01.2024 | Gundê Etitê |
| 24. | Cihan | Ahmed | 43 | Pêş Lîsans | Bermalî | 21.01.2024 | Navend |
| 25. | Nafii | Mıhe | 79 | Lîsans | Mamosteyê Teqawitbûyî | 23.01.2024 | Navend |
| 26. | Mehdiye | Yasin | 68 | Nexwende | Bermalî | 23.01.2024 | Navend |
| 27. | Muhammed | Ahmed | 54 | Dibistana Navîn | Karker | 29.08.2023 | Navend |
| 28. | Jiyan | Musa | 38 | Dibistana Navîn | Bermalî | 21.01.2024 | Navend |
| 29. | Zeynep | Ahmed | 27 | Lîsans | Freelancer | 25.01.2024 | Navend |

| | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 30. | Fatima | | | | | 26.01.2024 | Navenda Duhok'e |
| 31. | Fatima | Titeb | 43 | Pêş Lîsans | Mamoste | 26.01.2024 | Navenda Duhok'e |
| 32. | Aziza | Titeb | 60 | Pêş Lîsans | Mamoste | 26.01.2024 | Navenda Duhok'e |
| 33. | Hanım | İbrahim | 57 | Dibistana Seretayî | Bermalî | 27.01.2024 | Gundê Talwa |
| 34. | Beyan | Hacı | 45 | Dibistana Seretayî | Bermalî | 28.01.2024 | Navenda Duhok'e |
| 35. | Fehime | Abdullah | 68 | Nexwende | Bermalî | 28.02.2024 | Navenda Duhok'e |
| 36. | Fatima | Keko | 31 | Pêş Lîsans | Hemşîre | 22.01.2024 | Gundê Eminke |
| 37. | Delal | Muhsin | 43 | Lîse | Bermalî | 28.01.2024 | Navenda Duhok'e |
| 38. | Runahi | Ömer | 50 | Lîse | Bermalî | 28.01.2024 | Navenda Duhok'e |
| 39. | Deyka Zeynebe | | 58 | Lîsans | Bermalî | 28.01.2028 | Navenda Duhok'e |
| 40. | Hayat | Salih | 82 | Nexwende | Bermalî | 23.02.2024 | Online |
| 41. | Nejibe | Hüseyin | 47 | Dibistana Seretayî | Terzî | 23.02.2024 | Online |
| 42. | Zeynep | Şemseddin | 94 | Nexwende | Bermalî | 29.02.2024 | Online |
| 43. | Şeyma | Ahmed | 34 | Lîsans | Bermalî | 12.05.2024 | Online |
| 44. | Tahsin | Abu | 64 | Lîsans | Mamosteyê Teqawitbûyî | 05.03.2024 | Online |
| 45. | Lumya | Hüseyin | 41 | Pêş Lîsans | Mamoste | 23.02.2024 | Online |
| 46. | Asya | Tawfik | 71 | Nexwende | Bermalî | 29.02.2024 | Online |
| 47. | Sure | Gergeri | 50 | Lîsans | Hekîm | 28.01.2024 | Navenda Duhok'e |

| | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 48. | Fatima | Ali | 62 | Pêş Lîsans | Mamoste | 31.08.2023 | Navenda Duhok'e |
| 49. | Asma | Şahin | 70 | Nexwende | Bermalî | 27.01.2024 | Zawîte |
| 50. | Semira | Cercis | 56 | Dibistana Navîn | Bermalî | 25.01.2024 | Navenda Duhok'e |